Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1076 25-Hezîran- 2023 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Hunera pêşiyên xwe vediguhêze zarokan

**Nûr Mihemed ciwaneke Kurd a ji Efrînê ye û piştî dagirkirina bajarê xwe koçî Helebê bû. Ev 7 sal e li tembûrê dide, hem jî hezkiriyên vê amûrê perwerde dike û hewl dide çanda tembûrê belav bike.**

Nûrê dibêje ku wê di 14 saliya xwe de dest bi rêwîtiya xwe ya bi tembûrê re kiriye û ew bi saya desteka dayika xwe gihaştiye vê asta pisporiyê. Di dema dagirkirina Efrînê 18`ê Adara 2018`an de, Nûr tevî tembûra



xwe ji Efrînê derdikeve û ew dibe hevala wê ya rêwîtiya koçberiyê. Heta digihêje bajarê Helebê jî dev jê bernade. Nûr, di 15`ê Hezîrana 2022`yan de dibe endama Navenda Tevgera Hîlala Zêrîn a li taxa Şêxmeqsûdê û di nava Koma Şehîd Vejîn de cih digire. Bi vî rengî ber bi belavkirina muzîka kurdî ve pirekê ava dike.

Nûr dibêje: "Bi tevlêbûna min re, êdî ez beşdarî şahiyên li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê jî bûm."

Nûr di şahiyên li her du taxan de bi taybet di Newroz, 8`ê Adarê û Festîvala Şehîd Berçem (2022) de cih girtiye û xelat wergirtine. Nûrê diyar kir ku ji nava hemû amûrên muzîkê wê tembûr hilbijartiye. Piştî ku ew tev li Navenda Hîlala Zêrîn bûye, dest bi perwerdekirina 40 zarokan bi awayekî teorîk û pratîk kiriye.

Nûr tembûrê wek tiştekî herî sereke di jiyana xwe de dibîne û pê hestên xwe derdike. Ew dibêje xwendin û lêdana tembûrê di jiyana wê de xwedî heman girîngiyê ne û wexta xwe ya taybet bi tembûrê mijûl dibe.

Tembûr di çanda gelê Kurd de cihekî taybet digire. Nexasim ku 4 hezar sal beriya zayînê li Mezopotamyayê hatiye çêkirin û bi çanda Kurdan ve hatiye girêdan.

Di dîrokê de şêweyê tembûrê gelek caran guheriye û bi gelek navan hatiye binavkirin. Sûmeran navê 'qunur' Kenaniyan navê 'qîsare' Yewnanan navê 'bandûr' lê kiriye, li Qafqasyayê jî bi navê 'bantûrî' hatiye nasîn. Fars, Kurd û Ereban jî navê 'tembûr' lê kiriye.

Nûr Mihemed ê temenê wî (21) sale, ciwaneke Kurd e, ji gundê Sînka yê girêdayî navçeya Şera ya Efrînê ye. Hê ji zarokatiya xwe de bi awayekî akademîk fêrî lêdana tembûrê bûye. Nûr li Navenda Çand û Hunerê ya Efrînê di destpêka 2016`an de dest bi fêrbûna tembûrê kiriye û 2 salan perwerdeya xwe domandiye.

Ji 2016`an heta 2019`an beşdarî tu şahî yan festîvalan nebûye û piraniya dema xwe ji bo perwerdeya li malê û navenda çandê veqetandiye. Bi wî rengî ew bûye pispora lêdana muzîka kurdî û erebî li ser tembûrê.

# Li Swedê petroglîfên nû hatin kifşkirin



Mirovên berê yên ku di şikeftan de mabûn, li ser dîwarên şikeftan gelek wêne xêz kiribûn. Hin ji van xêzan bi zemanî re hatin kifşkirin lê hin ji wan jî veşartî man. Li herêma Bohuslan ya Swedê, tîmeke lêkoleran, hin ji van xêzên veşartî yên ku li ser dîwarên şikeftan hatibûn neqişandin, kifş kirin. Esas, ev xêz petroglîf in. Yanî teswîrên li ser şikeftan ên ku bi destan hatine çêkirin. Tê gotin ku ev xêzên nû hatine dîtin, beriya 2 hezar û 700 salan hatine neqişandin. Xêzên hatine kifşkirin li ser keviran ango kevirên nêzî behrê hatine neqişandin. Li gorî tîma lêkoleran, afirînerên van teswîran bi keştiyeke piçûk xwe nêzî van keviran yan jî şikeftan kirine û bi vî awayî teswîrên xwe çêkirine. Lêkoleran jî bi teknîka van insanên berê xwe gihand van şikeftan û ev teswîr kifş kirin. Ev teswîr bi rengekî spî hatine çêkirin. Weqfa "Bohuslan's Rock Carvings" got, "Ev teswîr di vî warî de tekane ne, li ser zemîneke 3 metre dirêj hatine teswîrkirin. Motîf û şêwazên teswîran dişibin yên Beriya Mîladê salên 800 û 700'î.". **Yeni Ozgur Politika**

# Roja çêkirî ya Çînê ji ya rastî bi pênc qatî germtir e

**Roja çêkirî ya Çînê, di testa dawî de gihîşt germahiya 70 milyon pileyî ku ev yek bi pênc qatî ji roja rastî germtir e. Zanyar bi hêvî ne ku amûra fuzyonê ya nukleerî bi rengekî bêdawî enerjiya paqij hilberîne.**



Li gorî medya dewletê, reaktora fuzyonê ya nukleerî ya li Çînê, 17 deqeyan bi pênc qatî ji Rojê bêhtir sincirî. Li EAST'ê ku ji aliyê Çîniyan ve hatiye avakirin, zêdeyî 10 hezar lêgerînerên zanistî yên Çînî û biyanî ji sala 2006'an ve ji bo pêkanîna 'roj a çêkirî' dixebitin. Ajansa Nûçeyan a Xinhuayê ragihand, ku Tokamaka Derbasker a Super a Pêşketî ya Ceribandinê (Experiential Advanced Superconducting Tokamak-EAST) di dema ceribandinê de gihîşt pileya 70 mîlyon santîgratê. Germahiya dendikê Roja rastî derdora 15 milyon pileyî santîgrat e. Armanc ji çêkirina cîhaza Roj a çêkirî ew e, ku reaksiyona xwezayî ya li stêrkan teqlît bike û bi vî rengî enerjiya paqij a bêdawî bi dest bixe. Ji Enstîtuya Fîzîka Plazmayê ya Akademiya Zanistiyan a Çînê rêveberê ceribandina dawî û lêkolîner Gong Xianzu ji ajansa Xinhuayê re axivî û got, "Operasyona dawî bû bingeheke xurt a zanistî û ceribandî ya li ser lihevxistina li rektoreke fuzyonê." Projeya EAST'ê ku bi 835 milyar Euroyî hate çêkirin, wê ceribandinên xwe heta meha Hezîranê dewam bike.

Fuzyona nukleerî weke tasa pîroz a hilberîna enerjiya paqij tê pênasekirin, lê belê li gel lêkolînên bi dehan salan ên têkildarî teknolojiyê jî heta niha li derveyî laboratûwarê nehatiye pêkanîn. Reaktorên fuzyona nukleerî ku fîzîka Rojê ya rasteqîn kom dike, ji bo karibe elektrîkê biafirîne, dendikên atomê gihand hev.

Ev pêvajo ne bi bikaranîna sotemiya fosîlê pêk tê, ne jî bermahiyên metirsîdar li pey xwe dihêle. Fîzîknas her wiha îdîa dikin ku bi vî karî re rîska felaketeke hawirdorî gelekî kêm e.

Tîma reaktorê ya Çînê wê piştgiriya teknîkî bide projeya mega ya reaktora fuzyonê ya nukleerî ku niha li bajarê Marsîlya yê Fransayê tê avakirin. Reaktora Ceribandinê ya Termonukleerê ya Navneteweyî (ITER) dema ku qediya wê bibe reaktora herî mezin a cîhanê.

Sudoku: Bersiv 85

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 3 | 4 | 9 | 6 | 7 | 2 | 8 | 1 |
| 6 | 2 | 7 | 8 | 5 | 1 | 9 | 3 | 4 |
| 1 | 9 | 8 | 2 | 4 | 3 | 7 | 6 | 5 |
| 4 | 6 | 2 | 7 | 3 | 9 | 1 | 5 | 8 |
| 9 | 7 | 1 | 4 | 8 | 5 | 3 | 2 | 6 |
| 8 | 5 | 3 | 1 | 2 | 6 | 4 | 7 | 9 |
| 7 | 4 | 6 | 3 | 1 | 8 | 5 | 9 | 2 |
| 2 | 8 | 9 | 5 | 7 | 4 | 6 | 1 | 3 |
| 3 | 1 | 5 | 6 | 9 | 2 | 8 | 4 | 7 |

Sudoku:Pirs 86

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 3 | 8 | | | | | |
| 7 | | | 9 | | | | 2 | 3 |
| 5 | | | | | 4 | | | |
| 6 | | 1 | 5 | 4 | | 2 | | |
| | | 4 | 3 | | 9 | 1 | | |
| | | 5 | | 2 | 7 | 3 | | 4 |
| | | | 4 | | | | | 9 |
| 9 | 4 | | | | 5 | | | 8 |
| | | | | | 3 | 7 | | |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Antrenor (Fransî) | Fêrkarê/a werzişvanan, kesê/a werzişvanan perwerde dike. Rahêner |
| Behre | Jîrî, jêhatin, şiyan, karîn, huner, qabiliyet: Xwendekar bi perwerdeya taybet behreya xwe pêş dixin. |
| Rahêner | Fêrkarê/a werzişvanan, kesê/a werzişvanan perwerde dike. Antrenor |
| Rontgen (Fransî) | 1. Cûnek ronahiyê ye ku wêneyên hestî û hinavên mirovan yan jî nava tiştan pê tên kişandin. 2. Wêneyên bi wê ronahyê hatîn kişandin. 3. Makîneya ku ew wêne pê tên kişandin. |
| Sabotaj (Fransî) | Derbkirin, xerabkirin, pelişandin, pûçkirin: Bi çalakiyeke sabotajê hat kuştin. |
| Tansiyon (Fransî) | Fişara xwînê, zordayîna xwînê: Tansiyona nexweş pir bilind e. |
| Test (Ingilîzî) | Kirina tiştekî da bê zanîn ka wê serkeftî be yan na. Ezmûn, ceribandin, imtihan, prova |
| Tîm (Ingilîzî) | Çend kes yan tişt yên li gel hev. Deste, kom, taxim |
| Tomar | Parastina agahiyan yan berheman di ciyekî de. Qeyd, sicîl: Stiranên kevin tev tomar kirin. |
| Werziş | Spor, riyade |

# Zîlan xwedawenda azadiyê ye



Rastiya çalakiya hevala Zîlan, giyan û hebûna jina Kurd a azad û canfida dide xuyakirin ku, ew jina bi bîrdozî û felsefeya Rêber APO xwe ava û pêşxistiye. Herweha li her qadê bûye deng û rengê jiyana azad a ku xwe gihandiye asta ku bikaribe pêşengtiya jina Kurd û jina cîhanê jî bike.**R-6**

# 'Berxwedana gel pilanên dagirkeran têk birin'



Mistefa Nebo diyar kir ku dagirkeriya Tirkiyê piştî hilbijartinan qonaxeke nû ya êrîşên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê daye destpêkirin û weke gurekî har tavahî pîvanên mirovî binpê dike. Herwiha da xuyakirin ku berxwedana gel tevahiya plan û êrîşên dagirkeran têk dibe.**R-5**

**Astana di xizmeta dewleta Tirk de ye**
Zekî Bedran *R-5*



**Astana /20/ Ragihandina Şerê Li Dijî Demokratîkirina Sûriyê Ye**
Idrîs Henan *R-5*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1076 25-Hezîran- 2023 www.ronahi.net/ku/

# NEXŞERÊYA ASTANAYÊ LI DIJÎ GELÊN SÛRIYÊ YE

Hevseroka TEV-DEM'ê Rûken Ehmed diyar kir ku civînên Astanayê li dijî berejewndiyên gelên Sûriyê ye û got, hêzên ku di civîna Astanayê de beşdar dibin nûnertiya gelên Sûriyê nakin û ji bo berjewndiyên xwe gel dikin qurban.**R-4**




## Li navçeyên Qamişlo êrîşên dagirkeriya Tirk hatin şermezarkirin




Ji bo şermezarkirina êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê li navçeyên Çilaxa, Girkê Legê, Til Hemîs û Til Birakê meşên girseyî hatin lidar xistin.**R-3**

## Çend agahî li ser sînemaya kurdan

Yekem fîlma ku qala kurdan dike Zerê ye. Bi destê derhênerê ermen Hemo Beknazaryan sala 1926an li Ermenîstanê li gundekî kurdên Elegezê reş û spî û bêdeng hatiye kişandin.**R-7**




## 'Saziyên navnetewî hevkarên sûcên li dijî jinê ne'



Kiryarên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê yên li ser gelê Efrînê, bi taybet li ser jin, zarok û xwezayê didomin. Endama Kordînasyona Kongra Star a Şehbayê Gulê Mihemed da zanîn ku li hemberî kiryarên dijmirovî yên dagirkeriya Tirk rêxistinên navnetewî xwe bê dengin û bêdengiya xwe dibin hevkarên dagirkeriyê.**R-2**

# ‘Saziyên navnetewî hevkarên sûcên li dijî jinê ne’

Kiryarên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê yên li ser gelê Efrînê, bi taybet li ser jin, zarok û xwezayê didomin. Endama Kordînasyona Kongra Star a Şehbayê Gulê Mihemed da zanîn ku li hemberî kiryarên dijmirovî yên dagirkeriya Tirk rêxistinên navnetewî xwe bê dengin û bêdengiya xwe dibin hevkarên dagirkeriyê.

**Esma Mistefa/ Şehba**

Dagirkeriya tirkiyê û çeteyên pêve girêdayî li hember gelê Efrînê kiryarên dermirovî li ser gelê Efrînê didine meşandin. Di serî de dagirkerên tirk ji kuştin, revandin, tecawiz û talanê li ser civak û xwezaya Efrînê didine meşandin û ev kiryar hemû jî li ber çavê saziyên nevnetewî û cîhanî têne meşandin. Bi dirêjiya 5 salan ji dagirkeriyê bi hezaran jin rastî kuştin, revandin, girtin, tecawiz û destdirêjiyê hatine û hînajî ev kiryar berdewamin. Li hemberî van kiryaran dema ku welatî dengê xwe dikin, têne girtin û şidet li hemberî wan tê bikaranîn û dibe ku werin kuştin jî. Ji ber vê yekê ji neçarî gel bê deng dimîne. Her çiqasî ku ev hemû kiryar bi isbat, agahî, wêne, dîmen û şahidan hatiye belgekirin jî û gelek ji van kiryaran ji bona reya giştî hatine dayîn û ketine destê gelek saziyên navnetewî de jî. Lê heyanî îro jî hîn hesab ji dagirkeriya Tirkiyê nehatiye xwestin, cîhan û saziyên navnetewî jî li hemberî van kiryaran bêdeng in. Têkildarî sûc û kiryarên ku di Efrînê de li ser jinê tên kirin, Endama Kordînasyona Kongira Star Gulê Mihemed ji rojnameya me re axivî.



**gulê mihemed**

**`Bajarê aşîtî û xwşikbûnê bû ye goristan`**

Gulê anê ziman ku bajarê Efrînê bi bajarê jinê dihat naskirin, lê dijmin Efrîn kir goristan û wiha got: “Bajarê Efrînê di şoreşa Rojava de xwe birêxistin kir û li hemberî dewleta Sûriyê û komên çete serî rakir û xwe nesipart tu aliyan. Di şoreşê de jinên Kurd bi hêz û îradeya xwe û ji hemû aliyên jiyanê ve li ser bingeha fikirê Rêber APO yê azadî û wekheviyê tevlî meşa azadiyê bûn û xwe îsbat kirin. Lê bi dagirkirina Efrînê re bajarê ku bi navê heskirin û xweşikbûnê dihate naskirin bû goristan”.

**` Kiryarên dijmirovî li ser jinê bê hesab dimînin`**

Gulê diyar kir ku dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê bi dagirkirina Efrînê re tavahî pîvanên mirovî û exlaqî derbas kirine û wiha domand: “Bi dagirkirina Efrînê di 18 Adara 2018 an de, dewleta Tirk û çeteyan wê tavahî pîvanên mirovî derbas kirin û di serê van êrişan de jina kurd tê hedefkirin. Bi hezaran jin û zarok hatin girtin û revandin. Di girtîgehan de jin rastî destdirêjî, tecawîz, işkence û kuştinê tên û gelek jin çarenûsa wan hîn ne diyar e. Di 12’ ê Hizêranê de komên çete jinek ji gundê Qîbarê ku mala wê diket navenda Efrînê zêrên wê dizîn û destdirêjî lê hat kirin û di dawiyê de hate kuştin. Rojane li Efrînê bûyerên dijmirovî pêk tên, lê ne kes behsa van kiryaran dike û ne jî hesab ji dagirkerên tirk û çeteyan dixwazin.

**`Dagirkerî di hovîtiya xwe de tu sînoran nasnake`**

Gulê destnîşan kir ku dijmin dixwaze jiyan û çanda ku li Efrînê hatî avakirin ji holê rabike û bi zorê li ser gel ziman û çanda xwe ferzbike û got: “Dagirkerî dixwze li Efrînê destwerdan û guhertina demugrafîk çêbike. Reng û teşeya civakê ya aşîtî, azadî û demukrasiyê ku bi xwîna Şehîdan hatibû avakirin, ji holê rake û qirkirina çandî û hişmendî bide avakirin.



**`Cîhan li hemberî kiryaran bê deng e`**

Gulê di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku tavahî rêxistinên mirovî û navnetewî li hember kiryarên ku li ser jinê têne kirin bê dengin û wiha got: “Kiryarên ku di Efrînê de dibin ji 5 salan ve û ji hemû milî ve tên belgekirin û ji raya gîştî re tên eşkerekirin. Lê belê li hember van kiryar û sûcên ku têne kirin têne piştguhkirin û çav ji wan têne gitin. Herwekû ku li Efrînê ne dagirkerî heye û ne jî kiryarên dijmirovî têne meşandin, berûvajî vê yekê jî gelek dewlet û aliyên heyî destekê didine guhertina demugrafîk a ku li Efrînê tê meşandin. Bêdengî û çavgirtina ji van kiryarên ku têne meşandin, tê wateya qebûlkirin û hevkariya bi dagirkeriyê re.

# “Bi hêviya vegera Efrînê dijîm”

**Elîf Şêx Qenber a ji Herêma Efrîna ku ji hêla dewleta tirk ve hatiye dagirkirin û ji Efrînê hatiye koçberkirin, çîroka koçberî û zehmetiyê ku kişandiye vegot.**

Dewleta tirk a dagirker dîroka xwe ya qirkirina gelên Rojhilata Navîn qet ji bîr nake, ji bo wê jî her dem hewldana wê ya vejandina hukmê xwe yê Osmanî heye. Bi taybetî 10 sal in bi destpêkirina şoreşa Sûriyeyê re, dewleta tirk vî şerî ji bo xwe derfe dbibîne. Li ser vî esasî şer, êrîş û dagirkirina xwe li her çar aliyên Kurdistanê berfireh kir û ji gelek milan ve vê planê dide meşandin. Di sala 2018’an de jî dewleta tirk bi operasyoneke hewayî ya li ser herêma Efrînê dest bi dagirkirinê kir. Di vî şerî de destanên dîrokî hatin xêzkirin û gelê Efrînê yê berxwedêr 58 rojan li ber xwe da û li cîhanê deng veda. Mixabin di dawiyê de dewleta tirk herêm dagir kir bi hukmê balafir û çekên giran û di encamê de jî bi hezaran welatî hatin qetilkirin û bi hezaran jî ji cî û warê xwe koçber bûn. Yek ji wan kesan jî Elîf Şêx Qenber ji Efrînê ye, temenê xwe 60 salî ye, ew jî weke gelek welatiyên Efrînê bi darê zorê ji axa xwe hatin derxistin. Girêdayî dagirkirina Efrînê û êşa hu ew heyanî îro dikşînin û bi hêviya vegera Efrînê dijîn ewşa heyî anî ziman.



**Dagirkirina Efrînê û destana 58 rojan a berxwedanê**

Elîf Şêx Qenber qala êrîşên dewleta tirk ên ji bo dagirkirina Efrînê û destana 58 rojan ji berxwedana gelê wê kir û wiha got: “Jiyana me berî şer û êrîşên dewleta tirk li ser herêma Efrînê pir xweş bû lê piştî şer miletê me perîşan bû, em 6 malbat di nav hev de dijiyan ji ber ku mala me bû hedefa topbaranên dewleta tirk û çeteyên wê. Hêviya me ya rawestandina şer qut nebû, em li derdora Efrînê man ji bo careke din vegerin bajarê xwe piştî ku şer bisekine. Tiştekî me nema li ser rûyê erdê, ewqas şehîd û bedel hatin dayîn, malên me hatin wêrankirin, herêma me hat talankirin û bi hezaran malbat hatin koçberkirin. Di şev û rojekê de bi dehan balafirên dagirkerên tirk li ser asîmanê Efrînê difriyan û her der hate bombebaran kirin. Gelê Efrînê li hemberî êrîş û hovîtiya dewleta tirk berxwedaniyeke lehengî dane meşandin û 58 rojan li hemberî her cûreyên êrîşan li berxwe dan û destanên lehengiyê li ser rûpelên dîrokê xêzkirin.

**“Ez bûm şahida şer û komkujiyê ku li ser gelê Efrînê hate meşandin”**

Elîf Şêx Qenber da zanîn ku ew bûye şahida şer û gelek komkujiyên ku dewleta tirk li ser gelê Efrînê pêk anî her wiha got ku mala wê hatiye topbarankirin û bi darê zorê ji bajarê xwe hatiye derxistin û wiha dirêjî da gotinên xwe: “Em bûn şahidên gelek bûyerên bi êş û hovana yên ku li ser gel hatin meşandin. Dewleta tirk bi hezaran sivîl û zarok qetil kirin, bêyî ku cudahiyê di navbera wan de bike û nedigot ev sivlîl e, an leşker e, li her kesê dida wekî cinawerên hov. Ez ji neçarî ji bajarê xwe derketim, min digot ez ji mala xwe dernakevim lê top û bombebaranan çare li pêşiya me nehişt. Me pir zehmetî kişand heta ku em gihîştin Qamişloyê, bi me zehmet û giran dihat ku em ji bajarê xwe bi zorê derketin.”

**“Degirkeriya tirk a qirker û faşîs li Efrînê guhertina demugrafîk dike.”**

Elîf Şêx Qenber diyar kir ku dewleta tirk erdîngarî û xwezaya herêmê diguherîne û talan dike û wiha domand: Dewleta tirk guhertina demografîk li herêmên em yên ku dagir kiriye çêdike, malbatên çeteyên bi ser navê xwe ve li ser axa me û di malên me de bi cih dike, tu kes jî dengê xwe nake. Di heman demê de xwezaya hermên me dişewitîne û sererd û binerdê me talan dike.

**“Welatiyên ku li Efrînê mane her roj li hemberî wan kiryarên hovane têne maşdnin”**

Elîf Şêx Qenber bal kişand ser kiryarên dewleta tirk ên li ser gelê Efrîna dagirkirî ji qetilkirin û binçavkirinên ku dihêle niştecihên wê di nava metirsiyê de bijîn û got: “Li Efrînê welatiyên ku li cih û warê xwe mane, tu xêrê ji jiyana xwe nabînin û rojane tên binçavkirin û qetilkirin û ev yek li ber çavê hemû cîhanê tê kirin û kes dengê xwe jêre nake.”

**“ Hêviya me bi gel û şervanê me heye ku em ê, Efrînê rizgar bikin”**

Elîf Şêx Qenber desnîşan kir ku hêviyên wan bi serok û şervanên wan mezin in, herwiha teqez kir ku dê bi ser bikevin û bajarê xwe rizgar bikin û wiha pêde çû: Dewleta tirk bi salane êrîş bajarên me dike, topbaran, qetil dike, madeyên kîmyewî bi ser me de dibarîne, lê heyanî îro jî kes dengê xwe jêre nake. Em beşekin ji axa Sûriyeyê û ev welatê me hemûyan e bi tevahî pêkhateyan. Herweha pêwîste ku hikumeta Şamê li hemberî van êrişan bisekne û çavê xwe jêre negre. Rûsya û Amerîka li gorî berjewendiyên xwe tevdigerin, geleke em xwedî li hev derkevin û baweriya xwe bi dijmin û neyaran neynin. Hêviya me bi Rêber APO û şervanên me mezin e, em ê bi ser bikevin û bajarên xw rizgar bikin ji destên dijminan.”

**“Bi hêviya vegera Efrînê dijîm”**

Elîf Şêx Qenber bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: “Ev cihê bav û kalên me ye û em ji dema hatine dinyayê ve li vê derê dijîn, ev welatê me wê di hiş û dilê me de bimîne û nayê jibîrkirin. Eger Efrîn rizgar bibe ji çeteyan ez ê saetekê jî li vir nemînim, ez ê bi peyatî bimeşim heta Efrînê. Hêviya me ya vegera Efrînê roj bi roj mezindibe û ez bi vê hêviyê dijîm.” **JINHA**



# Çend agahî li ser sînemaya kurdan

**Salih Suleymanî**

Yekem fîlma ku qala kurdan dike Zerê ye. Bi destê derhênerê ermen Hemo Beknazaryan sala 1926an li Ermenîstanê li gundekî kurdên Elegezê reş û spî û bêdeng hatiye kişandin. Beknazaryan heman demê avakarê sînemaya ermenan e jî. Çîroka fîlmê ji aliyê Hakob Gazaryan hatiye nivîsîn. Vî kesî bi tîpên ermenkî alfabeya kurdî jî amade kiriye. Di fîlmê de Zarê û Seydoyê şivan dilketiyê hev in. Lê belê axayê gund Têmûr Beg çav berî Zarê dide û keşmekeşî wisa dest pê dike. Sala 1970 î bestekarê ermen Alexsandir Spendiarov bi muzîka xwe deng dide fîlmê. Fîlm him bi çîroka xwe him jî terza xwe ve hêja ye û destpêka sînemageriya kurdan e. Sala 2006an jî li Festîvala Fîlmên Kurd a Londonê bi arpa muzîsyena mezin Tara Caf hate nîşandan.

**Tirkiyê û evdo axa**

Li Tirkiyê jî yekem car kurd û sînema sala 1951ê rastî hev tên. Derhênerê eslê xwe kurdê Xarpêtê Atif Yilmaz, di fîlma xwe Mezarimi Taştan Oyun de yekem car kurd, her çiqas kurdî nebe jî, dibin mijara sîne- mayê. Senarîstê fîlmê Huseyn Peyda ku ew jî eslê xwe kurdê Riha ye, bi rola Evdo Axa ve reng û rûçikê kurdan gelekî qenc anî devê kamerayê. Jixwe mirov baş lê binêre, hîç cudahiya Evdo Axa û Têmûr Beg tune ye. Çîrok ji straneke kurdî a herêma Rihayê hatiye tomarkirin. Atif Yilmaz piştre gelek fîlmên xwe li ser jiyana kurdan çêkirin.
Xeynî wî gelekan dest pê kir. Ekserê wan jî li ser axa û began bûn. Zulfo Axa, Maho Axa û hwd.




**Efsaneya Yilmaz Guney**

Her çiqas despêka sînemaya kurd zûtir be jî, ji 1926an heta dawiya sedsalê di sîne- mayê de kurd tune ne. Piştî sala 2000ê, gelek derhêner û fîlmên kurd derketin. Him jî bi kurdî. Lê belê di vê navberê de Yilmaz Guney heye ku tena serê xwe şoreş kiriye. Hema bêje hemû fîlmên wî salên dawî li ser kurdan in. Fîlma wî bi navê Yol (Rê) sala 1982an li Festîvala Cannes’ê xelata palma zêrîn wergirt. Guney sala 1984an li Fransa bi pençeşêrê koça xwe dawî kir. Salên 90î bo sînemaya kurdan çend gav hatin avê- tin lêbelê zêde deng venedan. Wek mînak; fîlmên Mem û Zîn (Ümit Elçi-1991), Siyabend û Xecê (Şahin Gök-1991) Rêwîtiya Bê Deng (Brahîm Selman – 1994), Işıklar Sön- mesin (Reis Çelik – 1995), Güneşe Yolculuk (Yeşim Ustaoğlu – 1999), Sınır (Gani Rüzgar Şavata – 1999) hatin çêkirin.

**Mîlenyuma Kurdan**

Xelasbûna sedsalê gelek tiştên baş bi xwe re anîn. Ne tenê tiştên siyasî, gelek bûyerên hunerî jî di nav civaka kurd de pêk hatin. Gelek derhênerên kurd gihiştin, fîlmên xwedî xelat çêkirin û navê sînemaya kurd bilind kirin. Behmen Qubadî, Hiner Selîm, Cano Rojbeyanî, Xelîl Çiya, Şewket Emîn Korkî, Nuray Şahîn, Cemîl Rustemî, Huseyn Karabey, Hîşam Zeman, Kazim Oz, Miraz Bêzar, Ozgur Dogan, Taha Kerîmî, Mi- hemed Deracî, Celal Canroyî, Tayfur Aydin, Şiyar Abdî, Umur Hozatli, Orhan Eskîkoy, Karzan Kader, Omer Levendoglu, Elî Kemal Çinar, Ferît Karahan, Erol Mîntaş, Şirîn Cîhanî, Aydin Orak, Matîn Qubadî, Helkewt Mistefa, Bulent Gunduz, Husên Hesen, Omer Sehîm Xelîfe, Mihemed Elî Konar û gelekên din van salên dawî li ser navê sînemaya kurd berhem dan.

**Navnas, Kurdistan**

Bona mirovekî nasname, bona devletekî al çi be, bona fîlmekê jî navnas (kunye) ew piştî evqas berxwedan û têkoşîna netewî kurd bûn xwedî statû. Sala 2001ê yekem car derhênerê başûrî Cano Rojbeyanî di navna- sa fîlma xwe Jiyan de Kurdistan nivîsî. Piştî vê yekê bi piştgiriya başûr, gelek fîlmên menşe Kurdistan hatin kişandin. Wê pê ve, li platformên fermî û navnetewî ev kunye jî heye. Kîlometro Zeroya Hiner Selîm sala 2005an bi navnasa Kurdistan li Cannes’ê hat qebûlkirin. Cemîl Rustemî jî bi fîlma xwe Şîna Berfê ve beşdarî Xelatên Oscarê beşa fîlmên biyanî bû.

**Zazakî Sînema**

Sala 2004an Nuray Şahîn yekem dirêj metraj fîlmeke bi zaravayê zazakî kişand û li Ewropa da nîşandan. Fîlma derhênera hêja bi navê Perre Dima So beşdarî hin festîvalan jî bû û xelat jî qezenckirin. Tevî ku kurdên zaza gelekî bi hunerê re eleqedar in, mîsal muzîka zazakî gelekî serkeftî ye, di sînemayê de ev zarava kêm hatiye karanîn. Hiner Selîm fîlmê My Sweet Pepper Land zazakî tevde bi sê zaravayan kişand. Sala par jî Mihemed Elî Konar fîlma xwe Hewno Bêreng temamî bi zazakî kişand.

**Kurte metraj**

Bo derhêneran pêngava sereke bo xwe îsbatkirinê çêkirina kurtefîlman e. Her derhêner wisa xwe diceribîne û xwe dipîve. Ez dixwazim navê 4 derhênerên ku kurtefîlm çêkirine bînim ser ziman. Bawerim ev çar kesan dê rojên pêş me gelek fîlmên hêja bikêşin. Bi kurtefîlmên xwe ve huner û sînemageriya xwe piştrast kirine. Arîn Înan Arslan, Orhan Înce, Babek Amînî û Serhat Karaarslan.

**Festîvalên li Derwelêt**

Her karûbarê kurdan li ser sînemayê li derveyî Kurdistanê pêk tê. Mîsal yekem anîmasyona kurdî bi navê Efsaneya Kawa li Îngilîstanê hat amadekirin. Yekem fîlm li Ermenîstanê, yekem temsîliyet li Germanya, yekem xelat ji Ewropa filan û bêvan.
Yekem festîval jî li Londonê hat lidarxistin û berhemên ji Kurdistanê hatin nîşandan. Him deng veda him jî rêkûpêk tê kirin. Her çiqas li başûr û bakur gelek festîval hatin destpêkirin jî esas li ser navê kurdan mîhrîcanên baş li derveyê welêt çêdibin. Festîvala Fîlmên Kurd a Berlînê û Amerîkayê jî her sal tên kirin.

**Agahiyek magazînel**

Hema bêje hemû kurdên kurdîzan Evdila Keskîn dinasin. Li ser hesabên medyayê bi hezaran şopîner û heyranên wî hene.
Nizanim çend ji wan kesan dizanin ku vî camêrî fîlmeke sînemayê de jî rolekî girîng lîstiye. Di fîlma Hiner Selîm bi navê Dol (2007) de karekterê Çeto dilîze. Çeto li pey şopa cesedê xweşka xwe ye. Xweşka Çeto di goreke komî de hatiye veşartin. Bi min, gorî lîstikvanên salane gelekî qenc lîstiye. Mîna şervanekî ku li qada şer bireve her sengerê, kek Evdila jî warê kurdî her karê hêja kiriye. Fenanî xizmeta çand û ferhengê, xizmeta çapxane û paşxaneyê, karê sosyal medya û kurdînûsiyê, lîstikvanî jî li wî hatiye.

# War û Netewe

**Şaxweşîn Arya**

Warek, ji çand û bîra civakekê serbixwe, erdnîgariyeke yekpare ya bejahî pêktê. Di rastiya xwe de tu war ne parçebare û di nav berdewamiya warbûna gilovera cîhanê de tê pênase kirin. Helbet war tevî hemû razber kirina têgihê ji bîra civakê, cardin jî xwedî wê rewşa taybete ku dinizile hemû raman û kiryarên me. Di polîn kirina şiyanên hişî de jî war yek ji polîna herî sereke tê pejirîn. Ew çax em her çiqas war dikaribin ji bîra xwe razber bikin jî em nikarin bîra xwe ji war razber bikin. Wê çaxê em dikarin bipirsin; war, netewekê çawa ava dike û rewa bûna wî gelî ya li ser wê axê çawa gengaz dibe?
Weke xwezaya duyem çand, bi tiştên ava kirî – lê ne çêkirî



– pêşdikeve. Sedema hemû endazyariyên civakî têkdiçin ev e. Tiştek çêkirî li gel bê ferz kirin gel jî ligel vêya bertekên tund nîşan dide. Çiqas ramaneke tundraw be jî ji bo gel û dorhêla ku wî gelî têde şînbûye, ew raman ger bi rêyên xwezayî û di nav dîsîplînekê de hatibe pêşxistin biserdikeve.
Afirandina netewekê bi du tiştan gengaze; yek jê wareke û li dora wî warî têgihiştineke xwedanî bûnê ye. Ya duyem jî çîrokek – ango bîrdoziyek – ji aliyê gel ve bêpejirîn. Xwedîtiya li ser axê di bingehê xwe de rast dîtina çîrokê û berbelaviya çîrokê nîşan dide. çîrokek çiqas bergehê wê fireh ewqas dikare gel û komên civakê yên din di nav xwe de bihewîne û hewcedariya helandinê nebîne. Mînak çîroka newrozê di bingeha xwe de çîrokek ku Kurda li ser hîmê azadiyê li dor êgir civandiye lê di wê govenda azadiyê de her kes dikare ji xwe re cih bibîne û her kes li dor wî agirî rûnê. Ev netew bûnê ji Kurdayetiyê berbi Kurdistanîbûnê ve berfireh dike û Kurdistan di mêjiyê kêmaran de ji dêwek dibe welatek.
War, bi saya bîrdoziyê -çîrokê- berfireh dibe û ev berfirehbûna ramanî-hizrî, çalakbûnekê bi vê têgihê zêde dike. War, bi welatbûnê dibe rewşeke sekan ango çalak derxîne holê. Welatbûn, bi her awayên gengaz afirandina hişeke hevpar ya di navbera komên civakî de ye. Lê welatbûn, bê bîrdoziyeke hevpar negengaze tevî ku bi welatbûnê re gengaziyên pirhêlî yên nû ji bo bîrdoziyan dertên holê jî.
Qonax bi qonax war di çandê de wateyan diguherîne. Ji hevpariyê dibe bibe warên êş û janên girseyî û heya nefrî kirina wî warî-welatî. Lê dawiya dawî em rastî lehengek ku kes zûbizû behsa wan nake tên; rewşenbîr. Çawa bi gotina Rênas Jiyan herbek dikare milletekê ava bike bi vî rengî rewşenbîrek dikare welateke seranser biwate û bi çekên rewşenbîrî-civakî çekdar kirî ava bike.
Sazgêriya rêvebirina yekwala û yeknetew, waran dihelîne, ango wan ji hev parçe dike û armanc ew e ku waran ji piraniyê daxe yekê. Lê yek dibe pir be û pir jî yek be. Di yekkirineke çêkirî de bîra civakî derb dixwe û vê rewşê napejirîne. War jî mîna civakan diguherin û rûçikên nû digrin. Lê van rûçikan bi xwezaya xwe ya duyem em li waran dikin û waran li gor dilê xwe direqisînin. War sekane lê welat nesekane, çalake, diguhere û diguherîne. Di encamê de war çawa yekpare be em jî wiha pirparî ne. Divê em welatên xwe yên li gor vê rêgezê ava bikin.

# Zîlan xwedawenda azadiyê ye

**Elî Roj**

Rastiya çalakiya hevala Zîlan, giyan û hebûna jina Kurd a azad û canfida dide xuyakirin ku, ew jina bi bîrdozî û felsefeya Rêber APO xwe ava û pêşxistiye. Herweha li her qadê bûye deng û rengê jiyana azad a ku xwe gihandiye asta ku bikaribe pêşengtiya jina Kurd û jina cîhanê jî bike. Weke ku tê zanîn hişmendiya 5000 hezar sal ku li ser mejî û vîna civakê tê meşandin û bi taybet jî li ser jinê bi hemû şidet û dijwariya xwe hîn berdewam e. Hevala Zîlan bi yek biryar û bi yek pêngavê hişmendiya desthilatan hilweşand û mîna xwedavenda rêya azadiyê bi xwîna xwe jiyaneke azad li ser rûpelên dîrokê xêzkir. Zîlan ji bona hemû jinên Kurd û cîhanê mîna manîfistoya azadiyê bi ronahiya hizir û remanê xwe li ser rûpelên wijdanê mirovahiyê bi vîn û hebûneke azad hûnand. Bi saya çalakiya hevala Zîlan, Birîtan û bi sedên jinên Kurd yên canfida em gihiştin van rojan. Dema ku em dibînin di roja me ya îro de bi sedê jinên Kurd navê zarokên xwe kirine Zîlan, Birîtan, Bêrîva û Şîlan û berê xwe didin serê çiyayên Kurdistanê ji bona gihiştina jiyaneke azad û bi romet. Ev yek jî di serî de girêdayî çalakî û kesayetên mîna hevala Zîlan û bi sedê hevalên mîna wê ne. Ango mirov dikare bibêje ku Zîlan, Birîtan û Viyan bûne bi hezaran û hemû ketine ser rêya çiya û li azadiya xwe digerin. Zîlan ji bona me manîfistoya azadiya jinê ye, û her mirovekî azadîxwaz pêwîst e ku rastiya kesayet û çalakiya



hevala Zîlan di dil û remanê xwe de hîsbike û lêgerîna wê ya rastiyê û azadiyê baş bibîne û binirxîne. Herweha pêwîst e ku her mirovekî azadîxwaz çalakiya hevala Zîlan ji bona xwe mîna rêbazê sereke yê jiyana azad bibîne û binirxîne û her tim di nava jiyana xwe de zindî bihêle. Hevala ZÎlan mîna volqanekî bi ser dijmin de çû û li beramberî hemû êrîşên dijmin yên hovane bi dil û mejiyekî mezin û bi giyanekî canfeda xwe ji bona gelê xwe fedakir. Li gorî vê yekê rêbazê çalakiya hevala Zîlan cewherê şerê gelê şoreşgerî yê û şerê fedayî yê ku ji bona gihiştina serkeftinê tu astengiyan nasnake. Bersiv û çalakiya ku hevala Zîlan dayî dijmin, pêwîst e ku em ji bona xwe têxin bingehê şerê gelê şoreşgerî. Çalakiyên mîna çalakiya hevala Zîlan û Birîtan mirov nikare wan bi gotin û nivîsan bîne ser ziman û mafê wê bidiyê. Ji ber ku çalakiya Zîlan cihekî xwe yê taybet di dîroka şerê gerîla û tekoşîna rizgariya netewa gelê Kurd de digre. Di demeke ku têde dihate gotin, di şerê gerîla de xwe dubarekirin û xetimandin di warê tektîkên şer de tê jiyankirin. Lê hevala Zîlan bi çalakiya xwe da xuyakirin ku gerîla di her şert û mercî de dikare şer pêşbêxe û gelek rê û rêbaz hene ku gerîla bi rêya wan şer bide meşandin û bighêje armanca xwe. Hevala Zîlan di kesayeta xwe de da belîkirin ku dema mirov bi armenca xwe ve girêdayî be û hizrandina wê/wî li ser kar, xebat û şer hebe, dikare her tektîkên şer pêşbêxe. Çalakiya hevala Zîlan mirov dikare di çarçoveya fedayîtî û şerê gelê şoreşgerî û heta dawiyê girêdana bi fikir û bîrdoziya Rêber APO ve, bigre dest û binirxîne.

Sekin û biryara hevala Zîlan sekina azadiyê, tevlîbûna jiyana azad û lêgerîna heqîqetê ye. Hevala Zîlan bi çalakiya xwe berxwedana jina Kurd careke din zindî girt û rastiya wê di kesayeta xwe de gihande lûtkeyê. Zîlan li hemberî zihniyeta serdest û dijminê hov yê ku ji derveyî zimanê şer û agir tiştekî nizane bersiveke dîrokî bû. Ji bona ku mirov Zîlan nasbike pêwîst e ku mirov rastiya jinê ji dîrokê ve bigre dest û ji her milî ve binirxîne û asta girêdana Zîlan bi fikir û remanê Rêber APO ve bi rengekî baş bibîne. Ji ber ku Zîlan di serî de rastiya xwe û rastiya dîroka xwe naskir. Rastiya jinê û civakê naskir û li gorî vê yekê tevgeriya û lêgerîna wê ji bona naskirina heqîqeta Rêber APO pêşket. Herçiqasî ku mirov pênaseya vê yekê bike jî, hîn kêm dimîne û bandora çalakiya hevala Zîlan ji bona gel û gerîla çavkaniya coş û hêzê bû.

Li gorî vê yekê û tişta ku mirov dikare ji çalakiya hevala Zîlan derxîne holê ew e ku kesayetek dema ku bi xwe û hêz xwe bawer be, wê demê wê teqez bighêje armanca xwe. Çalakiya hevala Zîlan di serî de li hemberî bêbextî û reşkujiya ku li hemberî Rêber APO hatî meşandin bû. Lê di dema îro de jî hîn ev bêbextî û bi rengekî berfirehtir û bi hemû leza xwe berdewam e. Di serî de pêwîstî bi berxwedan û tekoşîneke bêhempa li hember dagirkerî û qirkirina çandî û hişmendî heye. pêwîst e ku gelê kurd ji heft salî heyanî heftî salî cihê xwe di nava vê pêngava şerê gelê şoreşgerî de bigre û bi hemû hêz û vîna xwe tekoşînê bike. Zîlan mîna xwedavenda azadiyê tê naskirin û ji bona jinên Kurd û jinên cîhanê sembola fedaytî û jina azad e. Li hemberî hemû êrişên ku li ser Rêber APO û gelê Kurd têne meşandin, pêwîstî li her devera ku gelê Kurd lê dimîne xwe bi rengekî herî baş rêxistin bike û her li qadan be heyanî azadiya fîzîkî ya Rêber APO pêkwere. Herweha dem hatjye ku jina Kurd li hemberî zor, desthilatî û hişmendiya mêrê serdest serî rake û asta tekoşîn û berxwedana xwe bilindtir bike. Çalakiya Hevala Zîlan û li gorî ku Rêber APO anî ser ziman: "Çalakiyeke bîrdozî û siyasî ye, û ew mîna Xeta bîrdozî tê nirxandin". Li gorî vê yekê û heyanî roja îro jî em li ser vê xetê tekoşîna xwe didine meşandin. Çalakiya hevala Zîlan di milê dem û cihê wê de, gelekî giring bû, ji ber ku hevala Zîlan di dilê dijmin de li dijmin da. Lê ji beriya wê jî hevala Zîlan di jiyana xwe de jî ev şer dida meşandin û di vî şerî de serkeftin pêkanî.

Nameya hevala Zîlan jî ji bona tevgerê tevahî mîna manîfistoya azadiyê tê pejirandin. Çalakiya hevala Zîlan di nava xwe de rastiya şerê gelê şoreşgerî dihewîne. Herweha rastiya kesayeta PKK'ê ya ku ji derveyî serkeftinê ji bona xwe tiştekî din napejirîne dide raberkirin. Ji ber ku hevala Zîlan rastiya Serokatî, PKK'ê û wata azadiyê û rastiya jiyana azad baş nasdikir. Ji bona vê yekê ew bi armanca xwe ve heyanî dawiyê girêdayî bû û ji bona gihiştina armancê tu sînor û astengî ji bona xwe nasnedikirin. Zîlan ji bona jina kurd û jina cîhanê û gelê kurd bû firişteya azadiyê û pêşenga gel.

# Bi karanîna erebeyan kevneşopiyeke hîn xwe diparêze

**Nehîr Pale**

Erdingariya di navbera her du çeman de (Mezebotamiya) xwedî çandekî dewlemend û kevnar e. Li vê xakê ji hemû pirsgirêkan re çareserî heye bê ku teqlîd bikin an jî çavên wan li dewletên derve bin. Xelkên herêmê li gorî derfetên xwe çareserî ji pirsgirêk û pêdiviyên xwe yên xwarin, vexwarin, cil û berg re pêk anîn e. Erebok jî mînaka vê yekê ye.

Girêdaneke xurt di navbera erdnîgarî, hesp û erebokan de heye. Erdîngarî çol e, dîroka hebûna hespan li vê erdîngariyê jî vedigere serdema Bronz 3300 BZ. Erebok jî sedsala 19`emîn li herêmê derketine.

**Li Dêra Zorê rengê erebokan**

Li gorî agahiya şêniyên herêmê sala 1920`an wan dest pê kirin erebok bikar anîn. Herêma ku lê bikar anîn zêdetirî xwe çole, ji sînorê Îraqê



heyanî bajarê Reqayê nêzî 33000 km dirêj e.

Ev erebok zêdetirî xwe ji aliyê jin ve têne bikar anîn. Demsala zivistanê û payîzê ji bo çandiniyê û demsala havînê jî ji bo rakirina mewsim û zebzeyan têne bikar anîn. Zebzeyên bexçeyên xwe li ser erebokan ji gundekî dibirin gundekî dîtir û difrotin. Wextê jin diçûn palehiyê yan giya ji bo lawiran kom dikirin, dîsa erebok bikar tanîn. Şênî hemû kar û barê xwe bi erebokan dikirin, çuyîn û hatina wan jî bi riya erebokan bû.

Di bazirganiyê de jî rolekî xurt leyîstiye, li gundewarên rojhilatê Dêra Zorê nêzî herêma El-Rewda û El-Bewara yên Iraqê ku li ser sînorê Iraq û Sûriyeyê ne, kaniya xwê heye. Xelkên gundewarên rojhilatê Dêra Zorê bi erebokên xwe ji mesafeta 120 km tanîn bazarên xwe û sûd jê werdigirtin.

**Erebok çawa çêdikirin?**

Di destpêka derketina wan de erebok dolabên wan ji text çêdikirin, niha erebok dîsa texte lê dolabên wê lastîkin weke hemû erebeyan. Malbatên ku erebokên wan hene carne li Hespê û carnan jî li ker siwar dikirin. Ji hespan jî teşeyê bi navê El-Kedîş zêdetirî xwe bi kar tînin.

Şêniyên gundê Ebû Herdûb-Cidêd Iqêdat ên gundewarên rojhilatê herêma Dêra Zorê heyanî niha erebokan bi kar tînin, her wiha li Reqayê jî erebok hene. Şêniyên van gundan ne ji feqîrtiyê erebokan bikar tînin, ew çandeke vê erdnîgariyê ye û bikaranîna erebokan rêbazekî wan ê kevnar e. Erebeyên ku li ser madeyên sotemeniyê dixebitin, nikarin di hemû rêkan de bimeşin. Hinek rê û cî hene şênî tenê dikarin erebokan tê de bidin bikar anîn.

**Erebok ziyanê nadin xwezayê**

Di encama bikaranîna erebeyên dîtir xweza gelekî tê gemar kirin. Hejmara wesayetên li ser mazot û benzînê dixebitin ji hejmara mirovan zêdetir buye. Dibe ku mirov her tim bibhîze, di encama qezayan de mirov mirine yan jî birîndar bûne. Lê erebok hem pêdiviya şêniyan pêk tîne, hem jî ziyanê nade xwezayê. Di dema bikaranîna erebokan de têkiliya di navbera civakê hîn xurtir bû, bi hevre dibûn alîkar û destek didan hev. Kîjan malbat xwestibane ereboka wan hebe, dikarîbûn peyde bikin, ji ber erebok ne buha bû û pereyekî zêde nedixwest. Kevneşopiyeke ku hebûna çanda herêmê diparêz e. Malbatên ku berê erebok bikar tanîn li malê ew dane aliyekî û weke kevneşopiyekê hiştine.



# Rêxistina Efûyê, ji bo 7 girtiyên Kurd ên ku jê re biryara darvekirinê hatî dayîn banga lezgîn kir

**Navenda nûçeyan**

**Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî ji bo 7 girtiyên Kurd ku bi hinceta beşdarbûna Serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' biryara darvekirinê ji wan re hatiye dayîn, kampanyaya îmzayan destpê kir û banga lezgîn kir.**

Di 16'ê Îlona sala 2022'yan de bi qetilkirina jina Kurd Jîna Emînî ji aliyê polîsên hîcab ên Îranê ve, Serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' bi pêşengtiya jin û ciwanan li seranserê Rojhilatê Kurdistanê û Îranê destpê kir ku hîna berdewam e.

Dewleta Îranê bi hinceta beşdarbûna Serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' ya li Rojhilatê Kurdistan û Îranê berdewam dike, ji bo 7 girtiyên Kurd, biryara darvekirinê pejirand.

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (AMNESTY INTERNATİONAL), bi daxuyaniyekê ragihand ku metirsiya darvekirinê li ser 7 girtiyên Kurd ku ji aliyê dewleta Îranê ve biryara darvekirinê jê re hatine dayîn, heye û her wiha bang kir ku divê bi lezgîn li dijî vê yekê dest bi çalakiyan were kirin.

AMNESTY'ê ji bo 7 xwepêşandanên



girtî ên Kurd ku navê wan eşkere kir, kampanyaya îmzayan da destpê kirin û wiha got: "Mihemed Boroxanî û Mehend Sedret Medenî li parêzgeha Elburz, Mecîd Kazimî, Salih Mîrhaşimî û Saîd Yaqûbî li parêzgeha Esfehanê, Mûcahîd (Ebbas) Kurkur li parêzgeha Xozistanê, Îbrahîm Narûyî, Mansur Dahmerde, Kambîz Harut, Şuayîb Mîr Beluçehî Rîgî, Mansur Hut û Nîzamuldîn Hut li parêzgeha Sîstan û Belucistanê, Manuşehr Nehman Navaz, Mihemed Gobadlu, Saîd Şirazî, Ebulfazil Mehrî Huseyîn Hacîlu û Muhsîn Rezazade Garagolu jî li parêzgeha Tehranê hatin darizandin. Ji bo herî kêm 7 girtiyan ku wan bi qestê kesê ne kuştiye, di çarçoveya kataloga ku pêwîst nake cezayê darvekirinê ji wan re were dayîn, cezayê darvekirinê hate dayîn."

# Rêveberiya Xweser jinek û 2 zarok radestî Danîmarkayê kirin

**Rêveberiya Xweser jinek û 2 zarokên çeteyên DAIŞ'ê radestî şandeya Danîmarkayê kirin.**

Li gorî malpera fermî ya Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, roja pêncşema borî şandeyeke Danîmarkayê serdana Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser kir. Şandeya bi serokatiya nûnerê Danîmarkayê yê taybet bi şerê li Sûriyeyê û herêmên Rêveberiya Xweser Nicholas Harris, ji aliyê endamê Desteya Rêveber a Daîreya Têkiliyên Derve Xalid Îbrahîm ve hat pêşwazîkirin. Her du aliyan rewşa Sûriyeyê û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nirxandin û bal kişand ser beyannameya çareseriya aloziya Sûriyeyê ku Rêveberiya Xwe-



ser ragihandiye, her wiha rewşa aborî û mirovî ya li herêmê û rewşa çeteyên DAIŞ û malbatên wan ên li kampên Hol û Rojê.

Xalid Îbrahîm diyar kir ku beyannameya Rêveberiya Xweser ji hêla gelek aliyên siyasî, civakî û hêzên navneteweyî ve erênî hat nirxandin û got: "Beyanname ji rêgez û armancên nîştimanî pêk tê. Li gorî beyannameyê, divê tevahî gelê Sûriyeyê beşdarî diyalogên bi armanca dîtina çareseriyê ji aloziyê re bibin. Beyanname ji 9 xalan pêk tê. Xalek têkildarî dosyaya penaberan heye. Rêveberiya Xweser teqez dike ku ew amade ye pêşwaziya penaberan bike û rê li ber koçberiyê bigire. Lê ji bo ev dosya were çareserkirina pêwîstî bi tevakarî û desteka navneteweyî heye.

Îbrahîm îşaret bi girîngiya berdewamkirina têkoşîna li dijî DAIŞ'ê kir û got, divê hikumetên dewletan welatiyên xwe yên di nava DAIŞ'ê de vegerînin û anî ziman ku vegerandina DAIŞ'iyan li welatên wan parçeyekî biçûk ji çareserkirina pirsgirêka DAIŞ'ê ye.

Xalid Îbrahîm da zanîn ku di demên dawîn de tevgera şaneyên çeteyên DAIŞ'ê zêde bûye û wiha domand: "Şaneyên veşartî yên DAIŞ'ê tevgera xwe zêde kirine, êrişî nuqteyên leşkerî û yên ewlehiyê dikin. Ev dide diyarkirin ku xetereya DAIŞ hîna heye û dewam dike. Ev şane dixwazin êrişî navendên perwerdekirinê û kampan bikin. Li ser vî esasî divê di aliyê aborî û xizmetguzarî destek bê dayîn. Divê jêderên terorê werin zuhakirin, ji ber ku xetereya wan ne li ser herêmekê ye, lê belê li ser tevahî cîhanê xetere ye."

Nicholas Harris jî pesnê tevgera di navbera Rêveberiya Xweser, QSD û Hêzên Koalîsyona Navneteweyî de da ku Danîmarka yek ji endamên wê ye.

Harris ji ber fedakariyên ku di şerê li dijî DAIŞ'ê dane, spasiya QSD'ê kir û diyar kir divê têkoşîna li dijî DAIŞ'ê berdewam bike heta ku ewlehî li herêmê mîsoger bibe. Harris got: "Danîmarkayê rewşa siyasî û aborî, mirovî û ewlehiyê ya li herêmê dişopîne û bi nûnertiyên Rêveberiya Xweser ên li Ewropayê re di nava têkiliyên domdar de ye."

Harris destnîşan kir ku Danîmarkayê dê têkildarî kampan piştevaniya xwe bi herêmên re dewam bike û ji bo istiqrar li Sûriye û Iraqê pêk were dê projeyan pêşkêş bike.

Piştre şandeyê nameya Qiraltiya Danîmarkayê ya ji bo Rêveberiya Xweser radestî Daîreya Têkiliyên Derve kir. Danîmarkayê di nameyê de spasiya Rêveberiya Xweser û hêzên wê yên leşkerî dike û desteka xwe pê re nîşan dide. Di dawiya hevdîtinê, Daîreya Têkiliyên Derve jinek û 2 zarokên çeteyên DAIŞ'ê radestî şandeya Danîmarkayê kir. **ANHA**

# Pûtîn: Prîgozhîn xiyanet kir û wê cezayê wî giran be

**Navenda nûçeyan**

**Serokê Rûsyayê Vladimîr Pûtîn got serokê hêzên Wagner xiyanet li gel kiriye û dê cezayê wî giran be.**



Serokê Rûsyayê Vladimîr Pûtîn li ser tevgera çekdarî ya ku şeva borî ya serokê hêzên Wagner Yevgeny Prigozhin got bersiva her 'îsyanekê' dê tund be.

Pûtîn di hevpeyvînekê ku kanalên Rûsyayê îro weşandî de, anî ziman ku nêzîkatiyên serokê Wagnerê mîna derbeyeke ji pişt ve ye.

Pûtîn got kesên li hemberî artêşê çekê rakin 'xayîn' in û wiha lê zêde kir: "Bersiva me dê li hemberî van gefan û li hemberî xayînan tund û hişk be."

Her wiha ragihand ku artêş dê dewlet û welatiyan ji hemû gef û 'xiyaneta li hundir' biparêze.

Li gorî nûçeya Reuters'ê ku agahiyên xwe spartine çavkaniyekî Rûsî, koma paramîlîter Wagner li bajarê Voronezh ê ku 500 kîlometreyan dikeve başûrê Moskovê, dest danîn ser kargehên leşkerî.

Li gorî nûçeya AFP'ê jî, lîderê Wagnerê Yevgeny Prigozhin vê sibehê derbasî baregeha giştî ya fermandariya artêşê ya li bajarê Rostov bû û tevî balafirgehê cihên leşkerî kontrol kirin.

Prigozhin roja îna borî banga serhildanê li hemberî fermandariya artêşa Rûsyayê kiribû û artêş bi kuştina gelek endamên Wagnerê di êrişên li Ukraynayê de tawanbar kiribû. Moskovê ev tawan derewandin û bi tawana 'banga îsyana çekdarî dike', ji çekdarên Yevgeny Prigozhin xwest wî bigirin.

# Li navçeyên Qamişlo êrîşên dagirkeriya Tirk hatin şermezarkirin

**Navenda nûçeyan**

**Ji bo şermezarkirina êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê li navçeyên Çilaxa, Girkê Legê, Til Hemîs û Til Birakê meşên girseyî hatin lidar xistin.**

Ji bo şermezarkirina êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê şêniyên navçeyên Qamişlo meşên girseyî li dar xistin.

**Çilaxa**

Şêniyên Çilaxa û gundewarên, endamên meclis, saziyên sivîl û leşkerî, Meclisa Malbatên Şehîdan û endamên Kongra Star, bi diruşma "Birêxistinbûyîna jinan bersiva êrişên dagirkeriyê ye" meşek li dar xist. Meşê li Qada Şehîd Mahsûm dest pê kir û piştî meşê mîtîngek li dar ket.

Di mîtîngê de şehîdên azadiyê hatin bibîranîn û sersaxî ji şehîdên komkujiya dawî re hat xwestin.




**Girkêlegê**

Di heman çarçoveyê de şêniyên Girkê Legê û endamên saziyên sivîl meşek li dar xist. Welatî li Qada Şehîd Xebat kom bûn, wêneyên şehîdên komkujiya dawîn, alên Kongra Star hildan. Piştî meşê li Çerxerêya Jinan mîtîng hate lidarxistin.

**Til Hemîs**

Li navçeya Til Hemîsê jî bi sedan şîniyên navçeyê û endamên saziyên sivîl meşek li dar xist û li Çerxerêya Sewamî ya li bakurê navçeyê meş veguherî mîtîngê. Di mitîngê de li ser navê Meclisa Navçeya Til Hemîsê axaftin hatin kirin û tê êrişa dawî ya dewleta Tirk a dagirker li dijî erebeya Meclisa Kantona Qamişloyê hat şermezar kirin.

**Til Birak**

Bi sedan xelk û endamên sazî, meclisên sivîl û nûnerên partiyên siyasî, şêx û rûspiyên navçeyê li pêş Firina Otomatîk kom bûn û meşek li dar xist. Li naverasta navçeyê meş veguherî mîtîng. Li wir endama rêveber a Meclisa Navçeya Til Birakê Xewle El Nasir axivî û banga azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan kir û got azadiya wî garantiya yekane ya demokrasiya li herêmê ye.

Di dawiyê de endama rêveber a Kongra Star a Til Birakê Rexed El Hisên jî bêdengiya navneteweyî li hember sûcên dewleta Tirk a dagirker şermezar kir û got ew ê bi hev re ji bo şikandina êrişên dewleta Tirk têkoşîn û berxwedanê xurt bikin.

# Rûken Ehmed: Civînên Astanayê li dijî gelan e

Hevseroka TEV-DEM Rûken Ehmed diyar kir ku civînên Astanayê li dijî berejewndiyên gelên Sûriyê ye û got, hêzên ku di civîna Astanayê beşdar dibin nûnertiya gelên Sûriyê nakin û tenê ji bo berjewndiyên xwe kar dikin.

**Reşo Mihemed/Qamişlo**

Kirîza Sûriyê 12 sal li pey xwe hişt û di encamê de bi 100 hezaran kes hatin kuştin û bi melyonan kes jî koçberbûn, herwiha ji ber şer bi 10'an bajar û bajarok bi temamî hatin rûxandin. Ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê gelek civîn û hevdîtinên navnetweyî pêk hatin, lê ji ber ku di van civînan de nûnerên gelên Sûriyê beşdar nebûn, tevahiya civînan bê encam man. Tenê yê ku di civînanan de beşdar dibûn hêzên desthilatdar û dagirker bûn ku ji bo berjewendiyên xwe kar dikin.
Herî dawiyê di 20'ê hizêranê de li paytexta Kazaxistanê, Astanayê, civîana Astana ya 20'an hat lidarxistin û di encamê de , wekî her car tu çareserî ji kirîza Sûriyê nehat dîtin, her aliyekî ji beşdaran ji berjewendiyên xwe hin şert û merc danîn.
Di dema ku civîn Astanayê ya dawiyê dihat lidarxistin, dewleta Tirk a dagirker bi balafirên bêmirov welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê dikir armanc.
Têkildarî Civîna Astana ya 20'an, herwiha girîngiya beyannameya Rêveberiya Xweser a ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê, hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Roken Ehmed ji Rojnameya Ronahî re axivî.



**'Civîna Astanayê li dijî gelan e'**

Roken Ehmed tekez kiri ku hêzên di civîna Astanayê de beşdar bûn, tenê ji bo berjewendiyên xwe kar dikin û wiha dewam kir: "Beriya niha, ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê gelek civînên wiha ku heman hêz tê de beşdar bûn hatin lidarxistin, lê tev jî ji çareserkirina pirsgirêka gelê Sûriyê re nebûn bersiv. Herwiha roj bi roj rewşa gel xerabtir bû û tevahiya van civînan bêencam man. Sedem jî hişmendî û siyaseta her aliyekî beşdar yên ku dikevin xizmeta berjewendiyên serweriya wan e. Herwiha berjewndiyên wan jî, berdewamkirina kirîza Sûriyê ye. Vê care dîsa ji bo heman mijarê, hêzên navdewletî yên weke Rûsiya, Îran dagirkeriya Tirk, hikumeta Şamê û Opozisyona Sûriyê di vê civînê de li hev rûniştine. Ev civîn di koka xwe de, ji bo gelên Sûriyê û Rêveberiya Xweser ya ku hertim doza çareseriya pirsgirêkên gel dike; dijber e û wê dîsa jî ev civîn bêencam bimîne."

**'Beyannameya Rêveberiya Xweser riya çarseriyê ye'**

Roken Ehmed da xuyakirin ku Beyannameya Rêveberiya Xweser, ne li gorî berjewendiyên hêzên desthilatdar yên li ser xaka Sûriyê ku ji bo berjewendiyên xwe kar dikin û wiha domand: "Beyannameya Rêveberiya Xwesr, pirojeyeke siberojê ya gelê Sûriyê ya girîng e. Armanc jê çareserkirina pirsgirêkên gelê Sûriyê û têkbirina dagirkeriyê ye.



Herwiha ji ber vê yekê jî kesên siyasetmedar, rewşenbîr û gelên azdîxwaz û aştîxwaz yên Sûrî, bi nêzîkbûyîneke erênî pêşwaziya vê beyannameyê kirin. Lê hikumeta Şamê, di derbarê vê yekê de bê helwest maye û heya niha jî ji bo nîqaşa çareseriya aloziya Sûriyê ne amade ye, ji ber ku ev hikumet di bin destê Rûsya û Îranê de ye û li gor siyaseta wan ya ku li dijî berjewndiyên gelên Sûriye, tevdigere û nêzî vê beyannameyê nabe. Riya çareserkirina aloziya Sûriyê bi danûstendinên aliyên Sûrî ye. Em hertim vê yekê dûbare dikin, heya ku hikumeta Şamê bi rengekî erênî nêzî vê beyannameyê nebe; wê kirîza Sûriyê aloztir bibe."

**'Dagirkeriya Tirk dixwaze dadgehkirina çeteyên DAIŞ`ê asteng bike'**

Hevseroka TEV-DEM`ê Roken Ehmed di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku sedem ji pirbûna êrîşên ku dagirkeriya Tirkiyeyê li ser bakur û rojhilatê Sûriyê dike; mijara dagehkirina çeteyên DAIŞ`ê ye û wiha got: "Ji destpêka derketina çeteyên DAIŞ`ê ku piştgira wan ya sereke dewleta Tirk ya dagirker bi xwe ye, wan perwerde dike û bi rê ve dibe. Herwiha DAIŞ`ê gelek komkujî, talankirin di derheqê gelê bakur û rojhilatê Sûriyê de kiriye. Niha jî hemû çeteyên ku di girtîgehên Rêveberiya Xweser de ne ku xetereke pir mezin li ser ewlekariya bakur û rojhilatê Sûriyê û tevaya cîhanê çêdikin, Rêveberiya Xweser ji bo dadgehkirina wan biryar daye. Ev yek jî nakeve xizmeta dagirkeriya Tirkiyeyê de, lewma pêla êrîşên xwe li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêdetir kiriye û li hember van êrîşan berxwedaniyeke bihêztir heye."

# Bi stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî berxwedan berdewam e

**Zana Roj/ Şehba**

**Êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên li ser bakur û rojhilatê Sûriyê bê navber didomin. Welatiyên Efrînê dan xuyakirin ku ew ê li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşgerî di xeta berxwedaniyê de dewam bikin û axa Ropjava ji dagirkeran re bikin goristan**

Piştî serketina Erdogan di hilbijartinan de, êdî dest bi pilanên nû yên dagirkirin û êrîşên li deijî Kurdan bi gelemperî û li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet kiriye. Seranserî herêmên Rêvberiya Xweser rastî êrîşên hewayê û bejayî tên. Li hember van polîtîkeyan gelê Kurd li tavahî herêmê biryara berxwedanî û tekoşînê da ne, li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşgerî gel biryara seferberiyê di pêvajoya nû de daye.
Têkildarî bîr û baweriya gel bi serkeftinê û bi binxistina pilanên dagirkeriyê, şêniyên Efrînê ji ji rojnameya me re axivîn û helwesta xwe dan xuyakirin.



Senaa Berekat

**`Wê Rojava ji dagirkeran re bibe goristan'**

Jina bi navê Senaa Berekat diyar kir ku ew ê armancên dewleta Tirk yên dagirkirina herêmê têk bibin û wiha got: "Di Hilbijartinên Tirkiyê de Erdogan bi xapandin û fêlbaziyan bi serket, li ser wê bingehê wê êrîşên xwe yên li dijî kurdan dewam bike û ji bo qirkirina kurdan çi ji destê Erdogan bê wê bike. Di fikirên wî yên faşîst de xeyal dike ku ger di hilbijartinan de bi serketiye wê li hember gelê Kurd jî bi ser bikeve. Lê tevahiya xeyalên faşîst li ser axa Rojava wê binax bibin."

**`Têkbirina îradeya gelekî wê ne pêkan be`**

Senaa da zanîn ku li hemberî êrîşan asta têkoşîna gel jî bilindtir dibe û wiha domand: "Dagirkerî her çiqasî biryara dagirkirin û qirkirinê wergirtibe jî, lê biryara gelê xwedî fikir û stratejî wê her tim li pêş be. Çawa ku Şoreşa Rojava bi 12 saliya xwe ji tekoşîn û berxwedaniyê xwe gihand vê astê, wê ji vir û şûn ve jî, serkeftin û têkbirina dijmin jî misoger be. Lewra heredem em vê yekê dûbare dikin, gelê ku li ser fikirê azadiyê û xwîna şehîdan mezin bûye, wê têkbirina vî gelê tu carî ne pêkan be."



Arêf amo

**`Bi stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî em ê tevbigerin`**

Di heman çarçoveyê de welatiyê bi navê Arêf Amo jî da xuyakirin ku ew ê li ser fikrê Rêber Abdullah Ocalan li ber xwe bidin û wiha domand: "Gelê Apoyî bi hemû pêkhateyên xwe bi fikirên Rêbertî re bûn yek û di oxira azadiyê de bedelên giran didin. Di şoreşê de em hemû şervan û milîtan in. Rêber Ocalan ji me re diyar kir ku divê herdem em berxwedan û têkoşînê dewam bikin. Ji ber wê, me xwe li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşger KIRIYE perçeyek ji têkoşîn û berxwedanê. Herwiha em ê bi vê helwestê di meşa xwe de bi îsrar bin û meşa azadiyê dewam bikiin."

**` Erkê hêzên navnetewî ye ku van êrişan rawestîne`**

Arêf di dawiya axaftina xwe de banga li tevahiya rêxistinên mafên mirovan û cîhanê giştî kir ku pêşiya êrîşên hovane yên dewleta Tirk a dagirker bidin girtin û wiha got: "Tevî hemû êrîşên hovan e, gelê Kurd bi hemû hêza xwe li hembe faşîzmê li ber xwe didin û tu carî teslîmkarî qebûl nekirine, ji lewra bûye hedefa dijmin. Li hember van êrîşên ku rojane sivîl, zarok û jinan dikin hedef, divê cîhan bêdeng nemîne, hêzên navnetewî li heber van sûcên ku tên kirin berpirsyar e û divê pêşiya van êrîşan werin girtin."



# 'Berxwedana gel pilanên dagirkeran têk birin'

Mistefa Nebo diyar kir ku dagirkeriya Tirkiyê piştî hilbijartinan qonaxeke nû ya êrîşên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê daye destpêkirin û weke gurekî har tavahî pîvanên mirovî binpê dike. Herwiha da xuyakirin ku berxwedana gel tevahiya plan û êrîşên dagirkeran têk dibe.

**Navenda nûçeyan**

Bakur û Rojhilatê Sûriyê di asta yekemîn de ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê ya faşîst ve tê hedefgirtin, rojane êrîşên hewayî û bejayî li ser heremê têne meşandin. Bi taybet piştî hilbijartinên serokkomariyê li tirkiyê ku careke din Erdogan bû serokkomar, êdî li dijî Kurdan siyaseta qirkirinê bi awayekî girantir tê meşandin. Ev yek jî di êrîşên dawiyê yên ku li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên kirin diyar dibe. Bi taybet li herêma Şehbayê bi balafirên bê mirov hemwelatî, hêzên Hikumeta Şamê, Hêzên Rûsiya û pêşengên tevgera azadiyê tên hedefgirtin. Di encama van êrişan de şehîd û birîndar çêbûn. Di 10 ê Hizêranê de bi balafireke bê mirov sê pêşengên tevgera azadiyê li herêma Şehbayê şehîd ketin.
Têkildarî êrîşên dagirkeriya Tirkiyê yên li ser herêmê berpirsê ofîsa têkiliyan a Rêveberiya Xweser li Şehbayê Mistefa Nebo ji rojnameya me re axivî.

**`Erdogan bi hikumeta şer dixwaze temenê xwe dirêj bike'**

Mistefa anî ziman ku Erdogan hemû derfetên dewletê bi karanî ji bona ku di hilbijartinan de biserbikeve û wiha got: "Di hilbijartinên Tirkiyê



mistefa nebû

û Bakurê Kurdistanê de di tora yekemîn de hikumeta MHP û AKP ê nikarîn biserbikevin. Li ser vî esasî di tora duyemîn de Erdogan tavahî hêza li ser erdê heyî û bi dek û dolaban û hîleyan bi zorê karî xwe li ser piyan bigre
.

**`Di civînên çar alî de Pilanên nû`**

Mistefa da xuya kirin ku piştî civîna car alî ya 4'ê Gulanê bi planên nû êrîşî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin û wiha domand: "Ji bo tengavkirina ewlehî û aramiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tavahî hêzên ku li Sûriyê cihê xwe digrin di nava lihevkirin û planên hevbeş dene. Bi serpereştiya Rûsiya di 4'ê Gulanê de civîna çar alî di navbera Rusiya, Tirkiyê, Îran û Hikumeta Şamê de hat çêkirin. Piştî van civînan êrîşên dagirkeriya Tirkiyê li ser herêmê zêdetir bû her wiha dorpêça Hihumeta Şamê girantir bû. Bi vê yekê tê xuyakirin ku di sedsala 21 yekmîn de ji bo Kurdan planên nû yên qirkirin û tunekirinê didin meşandin.

**Êrîşên hêzên dagirker li ser herêmê**

Di heman çarçoveyê de Mihemed derbarê êrîşên dagirkeriyê yên li ser Şehbayê wiha got: "Herêma Şehbayê ku koçberên Efrênê tê de jiyan dikin, rojane tê hedefgirtin bi taybet di van rojên dawiyê de yekemîn care ku balafirên bê mirov bi kûrahiya 35 k,m derbasî xaka sûriyê dibin û êriş dikin. Tenê di van demên dawiyê de û di 10 meha Pûşberê de di encama êrişên firokên bê mirov de 3 endamên YPGê şehîd bûn. Herwiha erebeyek hêzên Rusî hat hedefgirtin, di encamê de birînda û kuştî jî çêbûn. Di heman demê de di êrîşên li ser Til Rifet û gundewarên wê de jî kuştî û birîndarên hêzên Hikumeta Şamê çêbûn. Bi vê hovîtiyê dagirkeriya Tirkiyê di 16ê Pûşberê de nexweşxaneya Til Rifet hate topabaran kirin û di encama wê de jî sivîl û birîndar çêbûn. Herwiha ev êrîş li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê navber didomin. Dagirkeriya Tirkiyê piştî hilbijatinan weke gurekî hov û bê pîvan tavahî deverên herêmê toparan dike."

**Bêdengiya hikumeta Şamê û Rusiya li hemberî êrişan**

Mihemed daxuyakirin ku li hember van êrişan Hikumeta Şamê û Rusiya bê deng dimînin û wiha domand: "Di van êrîşan de, yekemîn car e ku hêzên Rusiya ji aliyê dagirkerên Tikiyê ve tên armanc kirin. Lê rûxmî vê yekê jî li hemberî êrişan kes dengê xwe nake û tu bertek li ser erdê nayên dîtin. Ev jî tê wateya ku li hember siyaseta Tirkiyê her kes bê denge û hevkare di van êrîşan de.

**`Gel bi berxwedanê planên navnetewî valaderxistin`**

Berpirsê Ofîsa Têkiliyan a Rêveberiya Xweser Mihemed Nebo diyar kir ku gel li beramberî êrîş û ambargoyê gav paş de neavêje û wiha got: "Rûxmî hovîtî û erişên dagirkeriyê, lê belê gelê Efrînê biryara berxwedan û têkoşênê da ye. Ev yek jî bi berxwedana 5 salan a li ser şopa şehîdên ku ji bona jiyana azad û rizgarkirina Efrînê û hemû heremên dagirkirî ji bin destê dagirkeran canê xwe fedakirine.

## Astana di xizmeta dewleta Tirk de ye



**Zekî Bedran**

Civîna Astanayê bi hedefgirtina Rêveberiya Xweser encam bû. Danezana encamê ya hatî ragihandin Rêveberiya Xweser neqanûnî îlan kir. Gelo Rêveberiya Xweser li gorî kîjan zagonê neqanûnî ye? Li herêmên ku DAIŞ'ê dagir kiribû kîjan zagon hebûn? QSD'ê hewl da bi hevkariya bi koalîsyonê re herêmên ku ji DAIŞ'ê rizgar kirine ewlehiya wan ava bike. Li van herêman hêzên Şamê nemabûn. Di pêşengiya Kurdan de li herêmên ku hatin rizgarkirin Rêveberiyên Xweser hatin avakirin. Pêwîst bû ku gel xwe biparêz e û ewlehiya xwe ava bike. Li herêmê bi milyonan kes dijiya. Rêveberiya Xweser çavkaniyên aborî yên li herêmê ji bo pêwîstiyên gel bikar anî. Di danezana encama Astanayê de tê xwestin ku çavkaniyên petrolê dewrî hikumetê bên kirin. Rêveberiya Xweser bi dehan car ev yek ji rêveberiya Rûsyayê re gotiye. Çavkaniyên li Sûriyê yê tevahî gel in. Hertim got bila pirsgirêkên me yên bi rêveberiya Şamê re çareser bibin û em di rêveberiyek demokratîk de li hev bikin. Rûsya di navbera Şam û Rêveberiya Xweser de navbeynkar bû. Dihat zanîn ku Rûsya alîgirê hikumeta Şamê ye . Li gel vê jî Rêveberiya Xweser diyar kir ku ew jî yekîtiya Sûriyê dixwazin û Rûsya weke navbeynkar pejirandin. Lê li gel ku salin di ser re derbas bûn jî di vê mijarê de pêşketinek çênebû.
Rûsya hewl dide rêyekî bibîne û DYE'yê ji Sûriyê derbixe. Ji xwe Îran û DYE di nava pevçûnê de ne. Mayîna DYE'yê ya li Sûriyê ne li ser xwesteka Kurdan bû. Rewşek bû ku şerê li dijî DAIŞ'ê derxist holê. Ne raste li Kurdan bê ferzkirin ku alîgirên DYE yan jî alîgirên Rûsyayê bin. Kurd û bi milyonan kesên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê yekîtî û demokratîkbûna Sûriyê dixwazin. Weke ku daxwazên gel tune ne û vegerîna beriya 2011'an ne rastiyek e. Bi sedhezaran mirovan jiyana xwe ji dest da. Bi milyonan ji cihên xwe koçber bûn. Ji bo avabûna yekîtiya Sûriyê û pêçana birînan pêwîstî bi nêrîn û polîtîkayek nû heye. Rêveberiya Xweser jî daxwaz û vîna xwe ya ji bo yekîtiyê gelek caran derxist holê.

Li şûna ku pêvajoya Astanayê dijminahiya Kurdan bike û dagirkeriya Tirkiyê rewa bike, pêwîst bû ku derxistina hêza dagirker nîqaş bikiribûya. Pêwîst bû ku ji bo dagirkeriya Tirkiyê bidawî bike nexşerêyek danîba holê. Lê berovajî tê kirin. Tirkiye ne weke hêzek dagirker, weke ku xwediyê Sûriyê ye nêz dibe. Destê xwe ji Sûriyê nakişîne. Dixwaze hindirê welat sazûman bike. Di demek ku bidawîkirina şerê li Sûriyê û lêgerîna çareseriyê pêk tê de, Tirkiye bazara êriş û dagirkeriyek nû dike. Ev êriş dibin sedema koçkirina bi sedhezaran kes û wêrankariyek giran. Hişmendiyek, tenê bila Kurd tune bin û Rêveberiyên Xweser ji holê rabe, çiqas mirov dimirin an jî çiqas mirov ji cihê xwe koçberbibin ne girînge, heye. Ji ber ku projeya dewleta Tirk a qirkirina Kurdan heye tevahî xirabiyan birêxistin dike. Dixwaze herkesî jî bike hevkarê vî sûcê giran ê mirovahiyê.
Yên ku Rêveberiya Xweser neqanûnî dibînin, gelo dagirkeriya Tirk zagonî dibînin? Di halê hazir de wiha xuya dike. Dewleta Tirk weke ku xwediyê Sûriyê ye pir rihet e. Ji bo dawî li dagirkeriyê bîne nexşerêyekî dananin pêşiya wî. Dagirkerî nayê şermezarkirin. Rêveberiyên Xweser ên ku gelê Sûriyê ji bo rêvebirina xwe ava kirine neqanûnî tên dîtin, lê dagirkeriya artêşa Tirk, bi hezaran çeteyên ku berhevkirî û berdide ser serê gel qanûnî ne. Hew evqas rastiya civak û dîrokê dikare bê berovajîkirin! Evqas lîstina bi nirx û zagonan tê wateya ku mirovahî tune bûye.
Êdî herkes dizane Îran û Rûsya hewl didin DYE'yê ji Sûriyê derbixin. Lê dewleta Tirk bê erêkirina DYE yê nikare li Idlibê dewletokekê ji El- Nûsrayê re çêbike. Pêwîstiya wî bi DYE'yê heye. Li ser dijminahiya Kurdan DYE'yê di bin xetê de digire. Di danezana Astanayê de bi awayek vekirî DYE hatiye hedefgirtin. Bersiva DYE yê ya li dijî wê ji bo Kurdan ne sûprîz e. Berdevkê Wezîrê Parastinê dibêje "Divê Tirkiye bizane em bi kî re û çima dixebitin". Balyozxaneyên Tirkiyê jî QSD û Kurdan hedef digire û dibêje "Têkiliya me ya bi wan re taqtikî ye, hestiyariye û demkurtiye". Ji Tirkiyê re dibêjin evqas bi ser me de neyên, me nekin hedef, em xweseriyê û Kurdan destek nakin. Ji xwe eger wiha nebûya her roj Tirkiye herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bombebaran nake û evqas qetilkirinan pêk nayîne. Dizane em bi kî re û çima. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rêveberî û derdorek heta bêjî demokratîk û azadîxwaz heye. Hevserokên kantona Qamişlo yên herî dawî dewleta Tirk ew qetil kirin jin bûn. Jin di civak û rêveberiyê de rolek bibandor dilîzin. Ji bo Kurdan û Rêveberiya Xweser tune bike çavê dewleta Tirk tarî bûye. Ne jin, ne zarok û ne jî temenmezinan nabîne. Sûcên mirovî û sûcê şer didomîne. Hêzên herî mezin ên cîhanî li Sûriyê parastina qada hewayî girtine ser xwe. Eger hevkariyê bi dewleta Tirk re nekin ev qetilkirin çênabin. Ne tenê qatil, hevkarên wan jî sûcdar in.

FENER



## Astana /20/ Ragihandina Şerê Li Dijî Demokratîkirina Sûriyê Ye

**Idrîs Henan**

Yek ji armancên bingehîn ê ku esasên platforma Astana ya di Çileya 2017`an de kolandiye, tunekirina projeya çareseriya demokratîk ji pirsgirêka Sûriyê re bû. Lew re jî; hemû pêvajoyên piştî wê dîrokê di heman cokê de herikîn û zemîna jinavbirina projeya demokratîkirina Sûriyê amade dikirin.
Ji ber vê jî; ti geşbîniyên gelan derveyî encamên Astana /20/ nîn bûn. Çav li rê bû ku kombûnek wisan a komplger, encamine wisan komplowar bi xwe re bîne.
Tekane tişta lê hatiye zêdekirin, muhra rejîma Sûriyê ye ku her kesê dixwaze kiryarên xwe rewa bike, muhra wê li bin biryarên xwe dide! Îro jî ev rejîm bi awayek fermî dibe parçeyek konsepta Astana û bi komê re, aloziya Sûriyê derbasî qonax û asteke nû ya têkoşîn, xebat û pevçûnê dibe.
Xalên deklerasyona Astanaya dawîn diyar dikin ku her pênase û gotina hatine kirin li gorî dilê dagirkeriya faşîzma Tirk hatine hûnandin. Ango; bazar û parvekirinek qirêj li wir hatine kirin û di encamê de têgîna "Terorê" li gorî edebiyata ototîter a Tirkiyê, Rûsya, Îran û rejîma Sûriyeyê hatiye pênasekirin û di şexsê Rêveberiya Xweser û Hêzên Sûriyeya Demokratîk de hatiye hedefnîşandan.
Durûtiya herî mezin ew bû ku projeya gelan a Rêveberiya Xweser weke projeyek parçekirina axa Sûriyê hatiye nîşandan. Tam berovajî rastiya bi salan a vê rêveberiyê ye ku axa Sûriyê ji parçebûnek muheqeq parastiye. Di heman demê de, nixumandin û erêkirina çi destdirêjiyên dagirkeriya Tirkiyê ya ji axa Sûriyê re ye. Her wiha; bi rengekî pir bê heysiyet, bê wîjdan û beloq, rewakirina dagirkirina faşîzma Tirk ji axa Sûriyê ye. Ango; çawa dikare tekane projeya neteweyî ya Rêveberiya Xweser ku bi destê hemwelatiyên pêkhateyên Sûriyê têye vesazkirin, weke projeyek parçeker bête hesibandin? Beramberî wê jî, projeya dagirkirina axa Sûriyê, guherînên demografîk û destdirêjiyên li ser rûmeta gelên Sûriyê, ji nedîtî ve werin destgirtin? Ev ne şirîkatî be, mirov dikare navekî din lê bike gelo? Ne erêkirina dagirkeriyê û rewakirina wê be, çi navekî din lê dibe gelo? Deklerasyoneke wisa qet behsa terora DAIŞ, El Qayîde û Îxwan El Mislimîn neke, gelo hemû projeyên bi piştgiriya şênber a faşîzma Tirkiyê li ser xaka Sûriyê tên meşandin, ne parçekirin bin, wê çaxê çi ne?
Diyare ku tirko derd û fobyaya xwe ya Kurdan veguhestiye wê derê û rejîma Sûriyê jî ku hema li ser lingan sekiniye daye iqnakirin ku kilîta misogerkirina desthilatdariya wê bi tunebûna Kurdan re guncaw dibe! Yanê xwedêgiravî çawa Kurdan û projeya pêşkêşkirine tune bikin, dê her tişt wek berê vegere û dê ti tiştek bi navê demokrasiyê û hiqûqê nemîne! Tekane rêye wê jî, qirkirina Kurdan û jinavbirina projeya Rêveberiya Xweser e!
Bê guman eger rêbaza fikirîna rejîma Sûriyê aqilê Tirk be, wê şaştiya stratejîk a ku 12 sal in nekriye, bike û dê bi tunekirina dagirkeriyê re ew jî tune bibe. Eger Tirko sûdek li kesî kiriba wê li xwe û gelên Tirkiyê kiriba. Rejîmek ewqas ketî û faşîst ku li ser qirkirinê bûye desthiltdar û jêdera alozî û pirsgirêkan, nikare çareseriyan bîne. Rejîma li Şamê jî vê yekê baş dizane. Dizane jî gihaye kîjana asta tunebûnê. Ango; eger mucedeleyek demokratîk li Sûriyê bi pêşengiya Kurdan ji projeya Rêveberiya Xweser re nîn ba, wê dualîteya diyalektîka têkoşînê li Sûriyê jî nîn bûya. Ango; eger danûstandina siyasî yên mendalên vî welatî bi xwe nîn be û ne li gorî biryarên navneteweyî be, ku mezintirîn hêza siyasî û leşkerî li ser erdê muxateb negire, dê hemû lihevkirinên derveyî vê îradê mirî biwelidin. Çawa werin dê wisa jî herin. Çawa Kurd dibêjin: dê siwar werin û peya biçin.